

Çavkanîyên Hizrî yên Feqîyê Teyran

Intellectual Sources of Faqah Tayran

Önder BEYTER

Önder BEYTER | 0009-0002-4859-3004 | beyter1990@hotmail.com
PhD. Candidate at Bingol University, Institute of Living Languages, Department of Kurdish
Language and Literature, Bingol, Türkiye

Citation:

Beyter, Ö. (2024). Çavkanîyên Hizrî yên Feqîyê Teyran. *Nubihar Akademi* 22, 31-61. DOI: 10.55253/2024.nubihar.1569361.

Article Type	Research Article
Submission Date	17.10.2024
Acceptance Date	23.12.2024
Publication Date	31.12.2024
Peer-Review	Double anonymized - Two External
Ethical Statement	It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.
Plagiarism Checks	Yes – iThenticate
Conflicts of Interest	There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.
Complaints	The author(s) has no conflict of interest to declare.
Grant Support	The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.
Copyright & License	Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0 .

Puxte

Edebîyata klasîk ji qederek çavkanîyên hizrî yên hevpar ên wekî dînî, tesewîfî, dîrokî û efsanewî sadir bûye. Şairên di vê qadê da bi mezmûn û mefhûmên hevbeş, berhemên xwe lê kirine. Wekî şairekî mitesewîf Feqîyê Teyran jî xwe li vê qadê girtîyê û berhemên xwe li gorî hiş û zêhna vê dinyayê dane. Di vê gotarê da bi rêbaza wesfî hewl hatîye dayîn ku xwendinek li berhemên Feqîyê Teyran bê kirin da ku çavkanîyên hizrî yên ku helbestên wî pala xwe danê bîn tesbîtkirin. Di vê xebatê da herweha çavkanîyên hizrî yên Feqî li gorî çar kategorîyan hatine vekolîn ku ew jî dîn, civak, însan û siruşt e. Bi qasî lêkolîna vê gotarê ew yek hatîye tesbîtkirin ku Feqî jî wekî her helbestvanekî klasîk, ji hêla jêderên hizrî va sûd ji dînê

Îslamê, tesewif, mîtolojiya civakên qedîm ên herêmê û herweha dîrok û efsaneyên Îranê wergirtîye. Dîsa di vê lêkolînê da derketîye holê ku çî berî xwe çî jî serdema jiyana xwe, Feqî dîroka Kurdî jî ji hêla hizrî va kirîye jêdera berhemên xwe.

Peyvên Sereke

Edebiyata kurdî, Feqîyê Teyran, çavkanîyên hizrî, edebîyata klasîk, tesewif.

Abstract

Classical literature is based on a number of common intellectual sources such as religious, mystical, historical and legendary. Poets who produced works in this field have benefited from common themes and concepts. As a sufi poet, Faqah Tayran also wrote her works according to the understanding of this world. In this article, all of Faqah Tayran's poems have been examined with a descriptive method in order to determine the intellectual sources that form the basis of his works. Again, in this study, Tayran's intellectual sources have been examined based on four categories: religion, society, human and nature. With this research, it has been determined that Faqah, like other classical poets, benefited from the religion of Islam, sufism and the mythology of the ancient societies of the region, as well as ancient Iranian history and legends. Again, in this research, it has been revealed that Faqah also included Kurdish history as an intellectual source in his works, either before him or in the period in which he lived.

Keywords

Kurdish literature, Faqah Tayran, intellectual sources, classical literature, sufism.

Destpêk

Edebiyata klasîk a gelên Rojhilata Navîn xwedî reng û dirûvekî hevpar e. Edebiyata klasîk a Kurdî jî ji vê hevpariyê pişka xwe sitandîye. Lewra çavkanîya ku ev cure edebîyat jê sadir dibe, yek e. Îja dema em bala xwe didinê ka ev çavkanî çî ye, em dibînin ku jêdera herî sereke şaristanîya Îslamê ye. Herweha ji xeynî dîne Îslamê, gelekî taybetîyên din hene ku edebîyata van gelan dike mişterek. Li gorî Adak, edebîyata klasîk, ew edebîyata nivîskî ye ku di serdema Îslamî da di bin bandora dîne Îslamê, zimanên Erebi û Farisî û herweha çanda Îranê da li gorî hin rêbazan hatîye meydanê (Adak, 2015, r. 30). Heçî Agah Sirri Levend (m. 1978) e, ew vê jêderê bi awayekî berfirehtir destnîşan dike. Li gorî wî, Qur'an, hedîs, kelam, qisse û mûcizeyên pêxemberan, tesewif, tarîx û esatîr ên wekî lehengên dîrokî û efsanewî, zanistên heqîqî û batil ên wekî kîmya û herweha sêhr û tilism, bezm û rezm, adet û rusûmat û herweha pendên pêşîyan ji jêderên hevbeş ên edebîyata klasîk in (Levend, 1984, r. 9-10).

Ji alîyekî din va her berhemeke edebî, awayek ji awayên rengvedana hizr, raman û bawerîyên serdem, civak û dorhêla xwe ye. Nivîskar an jî şair dema xwe bide ber fealîyeteke edebî, ne mumkin e ku xwe ji şert û mercên serdem û civakê rizgar bike, jê dûr bisekine û herweha xwe di birceke asê da tecrîd bike. Ev namzed naçar e ku rastîya serdem û civaka xwe raçav bike.

Piştî vê girîzgehê êdî em dikarin werin ser mijara vê gotarê. Ev xebat xwe lê datîne ku çavkanîyên hizrî yên berhemên Feqîyê Teyran tesbît û destnîşan bike. Heger em li

îfadeyên li jor binihêrin, anku em şert û mercên serdemî û civakî bidin ber xwe, em dibînin ku Feqîyê Teyran, di demekê da jîyaye ku edebîyata klasîk serwerê serdemê ye. Ji lewma jî me xwest ku em di vê xebata xwe da wê yekê ron bikin, gelo berhemên Feqî bi taybetîyên serdema xwe, anku bi taybetîyên edebîyata klasîk diguncin an na. Ji bo tesbîtîkirina vê jî helbet, divê ewil çavkanîyên hizrî yê Feqî bîn vekolan. Me jî hewl da ku em di vê gotarê da li ser vê mijarê rawestînin û çavkanîyên hizrî yê Feqî destnîşan bikin. Ronbûna vê mijarê herweha dê bi kêrî tayînkirina cureyê edebîyata Feqîyê Teyran jî bê. Lewra di lîteraturê da hê jî nîqaş hene, ka berhemên Feqîyê Teyran dikevin bin sîwana edebîyata gelêrî yan edebîyata klasîk. Helbet di vê xebatê da amanca me, ne bersivandina vê pirsê ye. Ji bo bersiva vê pirsê, serê ewil divê dîwaneke edîsyon-krîtîk a Feqî were çapkirin da ku dîtina bersiva vê pirsê hêsantir bibe. Ev jî mijara xebateke serbixwe û berfirehtir e. Nexwe em hêvî dikin ku ev gotar, qet nebe di encamê da hin nîşaneyan bi dest bixe ku bi kêrî mijara tayînkirina cureyê edebîyata Feqî jî bê.

Me ev lêkolîn bi rêbaza wesfî pêk anî û me "Dîwana Feqîyê Teyran" kir bingeha vê xebatê ku bi werger û şikara Kadri Yıldırım hatîye amadekirin û ji hêla Wezaretê Çand û Turîzmê va hatîye çapkirin. Ev çap, hemû berhemên Feqî yê ku heta niha hatine tesbîtîkirin li xwe digire. Ev jî tê wê wateyê ku me lêkolîna xwe li ser hemû berhemên Feqî pêk anî.

Dîsa bi qasî ku me çavê xwe li qada lêkolînên kurdî gerand, teza doktorayê ya Mûslih Sezer a li ser dîwana Melayê Cizîrî ne tê da, li ser çavkanîyên hizrî yê şairên Kurd ên ji serdema klasîk, lêkolîn nehatine kirin. Ev yek jî dike ku hem di vî warî da divê xebat bîn kirin û hem jî heger bîn kirin, dê rûbirûyî zehmetîya bertengîyê bîn. Ji ber vê sedema bertengîya lîteraturê me jî zehmetî kişand. Ji lewma jî me anî, dabeşîkirina beşên vê xebatê, li gorî beşên sereke yê xebata Sezerî, ji hev du qetandin û lêkolîna xwe pêk anî. Di vir da divê em wê yekê destnîşan bikin ku heger me bianîya, ev xebat li gorî teqşîmata Adakî yan jî sernavên Levend dîyar kirine bikira, em ê ji navê derneketana. Belê me rêbaza Sezerî şopand, lêbelê ew jî di hedêzatê xwe da tezeke doktorayê ye û bergeh û sînoren wê pir fireh in. Ji ber sînore hejmara rûpel û peyvan, em naçar man ku herdu beşên dawîn ên vê lêkolînê bi awayekî kurtir binivîsin.

Ev gotara me ji destpêkek û çar beşan pêk tê. Her beşek ji hêleke va li ser çavkanîyên hizrî yê Feqî radiweste. Li gorî vê, me beşa ewil ji bo çavkanîyên hizrî yê ku xwe dispêrin dîn û tesewîfê, beşa duyem ji bo çavkanîyên hizrî yê ku xwe dispêrin civakê, beşa sêyem ji bo çavkanîyên hizrî yê ku xwe dispêrin însan û beşa çarem jî ji bo çavkanîyên hizrî yê ku xwe dispêrin siruştê terxan kirin. Di beşa ewil da me hewl da ku em tesbît bikin bê ka Feqî, di berhemên xwe da çi unsûrên dînî û tesewîfî bi kar anîne. Di vê beşê da ji hêla mertebeyên heyînê, emilandina nav û sîfêten Xwedê, referêkirina ayet, hedîs û kitêbên pîroz, têgehên têkildarî axretê û herweha hinek unsûrên mayîn ên wekî tesewîf û unsûrên wê va em li ser helbestên Feqî rawestîyan. Di beşa duyem da em bi berfirehî li ser çavkanîyên ku jêdera wê

civak e rawestîyan. Di vê beşê da me alim û şairên serdemên berê, kesayetên dîrokî, efsanewî û hîkayewî, welat û bajar, jiyana civakî ya wekî bezm û rezm, muzîk, eşq û evîn û herweha gotinên pêşîyan ên ku di helbestan da derbas dibin destnîşan û şirove kirin. Di beşa sêyem û çarem da jî em bi kurtî li ser çavkanîyên bingeha wan însan û siruşt e rawestîyan.

1. Çavkanîyên Hizrî yê Bingeha Wan Dîn û Tesewif e

1.1. Dîn

Dema em li sercem berhemên Feqîyê Teyran dinihêrin, em dibînin ku Feqî ji dîn, anku dînê Îslamê di asteke pir zêde da sûd û mefa wergirtîye. Nexasim gava em li her çar menzûmeyên wî yê navdar ên *Bersîsê Abid*, *Şêxê Sen'an*, *Kela Dimdimê û Zembîlfiroş* dinihêrin, em dibînin ku Feqî ev berhemên xwe adeta rêz bi rêz bi jêderên dînî vestirane. Feqî di berhemên xwe da têgeh û termînolojîyeke pir dewlemend a dînî ya wekî mertebeyên heyînê, nav û sifetên Xwedê, pêxember, milyaket, kitêbên pîroz, axret, hedîs, çar xelîfe, sehabeyên pêxember û herweha mekanên pîroz bi kar anîne. Feqî dîsa di berhemên xwe da telmîh li jiyana û mûcizeyên pêxemberan ên wekî mûcizeya şeqkirina behrê ya Mûsa Pêxember û kerametên ewlîya û kesên ehlê Xwedê yê wekî Bersîsê Abid, Şêxê Sen'an û Zembîlfiroş kirîye. Hetta dema em li menzûmeya Kela Dimdim a Feqî dinihêrin, em dibînin ku Feqî anîye, xwespartina bi Kela Dimdim a Emîr Xanê Bradostî û dorpêçkirina kelehê ji layê Safewîyan (Açar, 2019, r. 16) û herweha kuştina Emîr Xanê Bradostî û Ebdal Xanê Mukrî (Nêrweyî, 2019, r. 79), bi gotareke dînî pêşkêş kirîye. Dema em li berhemên Feqîyê Teyran dinihêrin, em dibînin wekî şairekî mitesewif, Feqî jî sûd ji termînolojîya dînî û tesewifî wergirtîye. Jêderên ku bingeha wan dîn û tesewif e mirov dikare wiha destnîşan bike:

1.1.1. Mertebeyên Heyînê

Mijara hebûn û cureyên wê di dîroka mirovahî û Îslamê da bûye yek ji mijarên herî sereke yê gengeşîyê. Di vê babetê da feylesof û aliman nêrînên xwe anîne ziman. Ev têgeha felsefî û mantiqî di heman demê da wekî “wucûd”ê jî tê emilandin ku tê maneya hebûn û heyînê. Di vê babetê da Durusoy wiha dîyar dike, “Ji hêla kirdeya fambar va wucûd wekî zihnî û xaricî dibe du beş. Ji xeynî vê dabeşîya ku ji esasên mantiqê ye, wucûd di bin sernavê mertebeyên heyînê da îcar dibe çar beş. Li gorî vê, wucûda tiştêkî yan di xaricê da, yan di zihnê da, yan di lefzê da û yan jî di nivîsê da heye” (Durusoy, 2013, r. 137). Dîsa li gorî Îbnî Erebyê ku hebûnê wekî new'ekî heyînê qebûl dike, ji bo ku heyîn were wucûdê divê ji mertebe yan jî astên heyînê di yekî da tazahur bike. Dema em li mijara mertebeyên heyînê jî dinihêrin, em dibînin ku mitesewif di vê mijarê da li hev nakin û lewma jî hejmarê mertebeyan li gorî mitesewifan diguhere. Hetta li gorî hin mitesewifan ev hejmar bêsînor e (Erdem, 2018, r. 210).

Îbnî Erebyê mijara mertebeyên heyînê di berhema xwe ya bi navê *Fusûsu'l-Hîkemê* da formule kirîye û li gorî wî mertebeyên heyînê heft in û ew jî ev in; a) Mertebeya Ehadîyetê. Ev mertebe kunha Xwedê ye û tu mertebe di ser vê ra tune; b) Mertebeya

Wehdetê. Ev, mertebeya esma û sifetên Xwedê ye; c) Mertebeya Wahidîyetê; d) Mertebeya erwahê: Ev mertebeya ruhan e; e) Mertebeya misalê: Ji vê mertebeyê ra hinek dibêjin mertebeya xeyalê. Lewra ferdekî ku di alema ruhan da zuhûr dibe, di vê mertebeyê da teşe digire ku dê di alema cismanî da jê ra bibe sûret; f) Mertebeya şahadetê; g) Mertebeya însan (Konuk, 2017, r. 11).

Dîsa ji miheqîqan hinek, van mertebeyan bi navê “ehadîyet”, “wahidîyet”, “erwah”, “misal” û “şahadet” dabeşî pênc mertebeyan dikin û jê ra dibêjin “hazaratê xemse” û herweha hinekên din jî van mertebeyan parveyî çar beşan dikin û jê ra dibêjin lahût, ceberût, melekût û nasût (Konuk, 2017, r. 71-72). Îja çî li gorî formulasyona Îbnî Erebi û çî jî li gorî ya mitesewifên din, gava em li berhemên Feqîyê Teyran dinihêrin, em dibînin ku haya wî ji vê mijarê heye û di helbestên xwe da amaje bi van mertebeyan kirîye. Hetta em dikarin bibêjin ku Feqî di danberheva xwe ya digel Mela da rasterast li ser vê mijarê nêrînên xwe anîye ziman. Bo nimûne bnr. helbesta Feqî ya heftem a bi sernavê “Muxatebeê Feqî û Mela (Teyran, 2022, r. 71-81).

1.1.2. Nav û Sifetên Xwedê

Di berhemên Feqîyê Teyran da em dibînin ku nav û sifetên Xwedê çî li gorî lefzê Qur’an û hedîsan û çî jî li gorî binavkirina însanan di gelek cihan da derbas dibin. Bi qasî ku me tesbît kirin, nav û sifetên Xwedê yê ku di helbestên Feqî da derbas dibin ev in: Ellah (7/12), Kerîm, Satir, Hakim, Wahid, Qadir (6/6), Barî (6/19), Rahim (6/20), Qehhar, Settar, Xeffar, Rehîm (4/4-5), Cebbar (10/8), Xaliq (7/15), Zulcelal (2/12), Yarê Heqîqî (7/15), Şahê Qudretê (2/9), Şahê Mezin (14/94), Şahê ‘Ellam (14/207), Padîşahê Mezin (1/34), Me’bûd, Xwedê (1/35), Baxoy (1/2) û Mîr (2/5).

1.1.3. Ayet, Mishefên Pîroz û Hedîs

Feqî di helbestên xwe da gelek ayet û hedîs jî refere kirine û bi qasî ku me tesbît kir, ew ayet û hedîs ev in:

Pirsa Feqî bêcih nebû
Lewra di Furqanê hebû
Erşê Xwudê li ser te bû
Avê gelo di bîra te tê (1/33)

Feqî di vir da ayeta 7em a Sûreyê Hûd bi bîr tîne ku ayet wiha ferman dike, “Xwedê ye, ew ê ku erd û asîman di şeş rojan de çêkirin û (berî çêkirina wan) erşê Wî li ser avê bû...”¹ Feqî gazî avê dike û jê ra dibêje, gelo tê bîra te ku erşê Xwedê li ser te bû û herweha bi berdewamî diyar dike û dibêje ku ev yek di Qur’anê da heye.

Nazika mehbûb ciwanik
Qameta bejna ziravik
Kullu şeyn dibe halik
Keyrî ji Şahê Qudretê (2/9)

1 Meala ayetên di vê gotarê da derbas dibin ji *Meala Qur’ana Pîroz a Kurdî*, (wer: Hüseyin Gündüz, Mehmet Seyhan), Weşanên Serokatîya Karûbarên Dîyanetê hatine wergirtin.

Feqî di vir da jî ayeta 88em a Sûreyê Qeses bi bîr tîne ku ayet ferman dike, “Ji xwedê pê ve her tişt fanî ye û namîne.” Feqî jî dibêje, belê tu hezkirîyeke nazik î, nazenîn î, ciwan î, wekî dara serwîyê zirav î, lê ji bîr neke, tu yê rojekê mirinê tam bikî, biçî helakê.

Mîm Hê şairê pak e
Her kesê bi rûh ji mak e
Hemîyan Xaliq fena ke
Xeyrî ji Şahê Qudretê (2/20)

Di vir da jî Feqî heman ayetê bi celebekî dîtir tîne ziman. Mîm û Hê anku ez jî di nav da her kesê ku ji dê û bavekî çêbûye, ew heyîne ku bi şûn da hatîye afirandin, fanî ne, Xaliq dê wan bişîne fenayê, Şahê Qudretê anku Xweda bi tenê ji vê munezeh e.

Bes e rabe ji vê xabê
Wekî bapîr wekî babê
Em jî dê biçne turabê
Bi bal Baxoy ve ferwar e (3/4)

Di vir da jî Feqî hem ayeta 55em a Sûreyê Ta Ha ya, “Me hûn ji wê (erdê) afirandine û dîsa em ê we li wê vegeftin û careke din jî (piştî mirinê) em ê we jê derfînin.” û hem jî ayeta 156em a Sûreyê Beqereyê ya “Em hemû (bende)yên Xwedê ne û em ê li wî jî vegeftin.” bi bîr tîne. Feqî xwe û însanan hişyar dike û dibêje, bes e êdî ji xewa xefletê hişyar bin, ka bavê me ka kalê me, nexwe em ê jî fenanî wan bimirin û cardin vegeftin cem Xwedê.

Dinê mehd e û mehlok e
Weku le’b e û leyzok e
Çi zanin tîfl û zarok e
Felek çerx e bêîqrar e (3/38)

Di vir da jî Feqî hem ayeta 64em a Sûreyê ‘Enkebût û hem jî ayeta 32yem a Sûreyê En’am bi bîr tîne ku ayet wiha ferman dikin, “Ev jiyana cîhanê tenê kêf û lîstik e (‘Enkebût 29/64); Jiyana vê dinyayê bes lîstik û mijûlbûn e (En’am 6/32).” Di vir da Feqî wê rastîya ku herdu ayetên navborî destnîşan dikin, tîne ziman û herweha dibêje ku lê zarok hew dizanin ku jiyana bi tenê ji lîstikê pêk tê û ji bo lîstik û kêfê ye. Lê felek nasekine dizivire, anku bi rastî jî hem dinya li dora xwe dizivire û hem jî ji zeman ra rawestan tune, ku emir çû tu êdî nikarî bidî dû.

Ew Mîr Kerîm e Satir e xweş Hakim e di barê xwe da
Xelqno! Ne dûr e hazir e ew wahid e û bêîbtida
Her çî bikit ew Qadir e ew xaliqê bê bab û da (6/6)

Di vê benda xwe da jî Feqî meala sûreyê Îxlasê daye. Feqî dîyar dike ku Xwedê mîr

e anku serwer e, comerd e û eyb û qusûrên însanan vedişêre. Herweha ew yek e, her dem hazir û nazir e, destpêbûn jê ra tune ye û ji dê û bavekî çênebûye.

Muksî yê jar û bedter im ferhemnî **xeyre'r-rahimîn** (6/20)

Di vir da jî Feqî diaya di dawîya sûreyê Mu'minûnê da ya "... li min rehmê bike, teqez tu yî çêtirînê dilovanan" bi bîr tîne. Feqî dibêje ku ew Muksî ye, jar û bedbext e û lewma jî ji Xwedê ra yê ku çêtirînê dilovanan e dia dike ku li wî rehmê bike.

Cemala nûrîn saf e di wechên tecellayê
Bi herfên xwe keşşaf e demîr didin me'nayê

Ha Mîm Eyn Sîn Qaf di remza muemmayê (7/6)

Di vir da Feqî wan herfên remzdar ên "Ha Mîm Eyn Sîn Qaf" ên di destpêka Sûreyê Şûrayê da bi bîr tîne û dibêje, nûra saf a wê cemalê ye ku xwe di her cure tecellîyê da dide der û bi herfên remzdar va xezîneya mexfî keş dike û maneyê didê.

Roja ku Adem afirî
Xaliq li Îblîs azirî
Bû mani'ê secde birî
Êxiste toqa le'netê (14/26)

Xaliq li Îblîs kir xedeb

Bapîr bi cih nanî edeb

Adem şeyatîn bû sebeb

Avête der ji cennetê (14/27)

Di van herdu bendan da jî Feqî qala ayetên 34-36em ên Sûreyê Beqereyê dike.² Feqî dîyar dike, roja ku Adem hat afirandin, Îblîs secde neanî û lewma jî Xwedê lê hate xezebê û toqa le'netê xist stû. Xaliq li Îblîs hate xezebê, lêbelê Adem jî netebitî, bi sebebolañiya şeytanê bêmriya Xwedê kir û lewma Xwedê jî ew ji cennetê derxist.

Ew çîjekî navê Weswas
Ê ling ture kêmi û kas
Rabû ji nava el-Xennas
Ji babê xwestî hîmmetê (14/35)

Di vir da Feqî ayeta 4em a Sûreyê Nas bi bîr tîne ku di ayetê da amaje bi şeytanê Xennas ên ku teletel yan jî nepen nêzîkî mirov dibin û weswese yê diniqutînin dilê

2 "Wê demê me ji firîşteyan (melayîketan) re got: 'Ji Adem re herin sicûdê.' Ji bilî Îblîs hemû jê re çûne sicûdê. Ew neçû sicûdê, wî xwe mezin dêra û (ji ber vê yekê) ew bû ji kafiran (34); Me got: 'Hey Adem! Tu û hevsera xwe (Hewa), li bihiştê bicih bibin. Çawa dilê we bixwaze wisa bi noşcan ji xweşiyên wê bixwin û xwe nêzî vê dara ha mekin, vêca (eger hûn nêzî wê bibin) hûn ê bibin ji zaliman' (35); Vêca Şeytên ew ji cennetê şemitandin; êdî ji nav xweşiyên ku ew tê de bûn derandin. Me got: 'De dakevin ji wir, hûn ê ji hev re neyar bin. Heta hûn sax bin li erdê ji bo we niştecihbûn û pêxweşî heye.' (36)." (wer: Gündüz û Seyhan, 2015, r. 8).

mirov. Di vir da Feqî jî destnîşan dike, çêlikekî yan jî sêlekekî bi navê Weswas ê ling gop, ji nava şeytanên Xennas ên hatina wan teletel e, rabû û ji bavê xwe alîkarî xwest û got ku ew dikare peywira “xapandina Bersîs” bi cih bîne.

Gelek sotim kirim kibab
 Kirye bi min sed reng xirab
Ya leytenî kuntu turab
 Wêran ez im malim xirab (18/12)

Di vir da jî Feqî ayeta 40em a Sûreyê Nebe' bi bîr tîne ku di ayetê da wiha tê fermankirin, “Bêguman me hûn bi ezabekî nêzîk hişyar kirin. Ew roja ku her kes kar û kiryarên xwe dibîne û yê kafir dibêje: Xwezî ez ax û xwelî bûma!” Feqî jî dîyar dike ku ew şermezarbûna kafiran a di vê ayetê da dike ku cergê mirov fenanî kebabê bisoje û rengê mirov jî ji tirsan bi sed celebî xirab bibe.

Încîl

“Încîl” yek ji çar kitêbên pîroz e, ji Hz. Îsa ra hatiye şandin û kitêba pîroz a Xirîstiyanan e (Pala, 2005, r. 232). Herweha peyva încîlê di Qur'anê da jî derbas dibe. Di Qur'anê da tê dîyarkirin ku Încîl ji hêla Xwedê wekî wehîy ji Îsa Pêxember ra hatîye şandin (Alî Îmran 3/3; Maîde 5/46; Hedîd 57/27).

Dixwum sondê bi bab Adem
 Bi **Încîlê** kelam dadem
 Êdî meylê bi te nadem
 Te ne ehd e ne îqrar e (3/69)

Di vir da jî Feqî sondê li ser Adem Pêxember û herweha kitêba pîroz Încîlê dixwe ku ew ê êdî careke din berê xwe nede dinyayê ku jê ra ehd û qirar tune.

Hedîs

Hz. Pêxember di hedîseke xwe da dîyar kirîye ku dinya zevîya axretê ye (Aclûnî, 2019, 415). Anku li dinyayê tu çî biajoyî, li axretê tu yê wê bidirûyî.

Dinê xelqno bi kê maye
Belê qenc e û mezra ye
 Ji xêra ra Xwedê daye
 Xebatkar bin ku ev car e (3/45)

Feqî di vê benda xwe da balê dikişîne ser fanîbûna dinyayê û dîyar dike ku dinya ji kesî ra namîne, lêbelê dîsa jî ji bo însanan wekî zevîyeke qenc e û herweha Xwedê daye da ku însan li wir, baş bixebitin û xêr û xêratan bikin.

1.1.4. Milyaket

Munker û Nekîr, wan herdu milyaketan îfade dikin ku dê li alema berzêxê jêpîrsîna însanan bikin. Di Qur'anê da ayetên amajeyê bi jiyana qebrê dikin hene, lêbelê behsa

Munker û Nekîr nayê kirin. Munker û Nekîr di hedîsan da derbas dibin. Di tesewifê da Munker û Nekîr tèn maneya qalibgirtina emelên baş û xirab ên însanan (Pala, 2005, r. 341).

Ji zulmatê bibînim fer
Nekîr têtin digel **Munker**
 Eya Me'bûd tu yî rehber
 Bi heqqê cumle Qur'anê (9/9)

Feqî di vir da dîsa ji bo tengasîyên di qebr û berzexê da dia li Xwedê dike ku li wî were rehmêtê. Feqî dibêje ku ew ê di qebrê da di nav zulmatê da bimîne û Nekîr û Munker dê bèn cem û wî bidin ber jêpîrsînê. Lewma jî Feqî wiha gazî Xwedê dike: "Tu yî rêberê min û min bide xatirê Qur'anê."

1.1.5. Pêxember

Feqî di berhemên xwe da bi wesîleyên cuda hin pêxember bi bîr anîne. Lêbelê di berhema xwe ya bi navê Beyta Dilî da ya ku peyama wê ya sereke, fanîbûna dinyayê ye, tevî kesayetên dîrokî û efsanewî, navê hivdeh pêxemberan anîne ziman û xwestîye ku pê nîşan bide ku waye dinya ji wan ra nemaye û lewma jî dê ji kesî ra nemîne. Pêxemberên ku navê wan di Beyta dilî da derbas dibin ev in; Adem, Şît, Nûh, Îdrîs, Yûnus, Eyyûb (3/52), Yehya, Salih, Harûn, Mûsa, Îsa, Ehmed [Mihemed] (3/53), Dawûd, Suleyman (3/57), Ye'qûb, Yûsuf (3/59), Îbrahîm (4/10). Em dibînin, Feqî di wê rêzîkê da ya ku navê Îbrahîm Pêxember bi bîr anîye, navê bavê wî Azer jî emilandîye. Di Qur'anê da jî navê bavê Îbrahîm Pêxember wekî Azer derbas dibe (En'am 6/74).

Feqîyê Teyran di menzûmeya Zenbûlfiroş da (15/37-42) bi kurtî serpehatîyên Pêxemberan ên Îbrahîm, Mûsa, Yûnus û Nûh derbirîye. Herweha em dibînin ku Feqî di Beyta Dilî da Mihemed Pêxember wekî Ehmed bi nav kirîye ku di rastîya xwe da Ehmed di Qur'anê da (Saf 61/6) ji bo Hz. Pêxember tê emilandin. Ji xeynî vê, Feqî wesfên pêxember ên wekî "Nebîyê Muxtar (3/82), Zatê Ekber (4/1), Şefî'ê Roja Mehşerê (4/7) û Seyyîdê Serwer (9/22)" emilandine.

1.1.6. Çar Xelîfe (Çaryar)

Di vir da em dibînin ku Feqî ji bo çar xelîfeyên ewil ên piştî Pêxember wesifandina "çaryar" (3/53) emilandîye ku ev wesifandin bêtir di nav Misilmanên Sunnî da berbelav e. Herweha "çaryar" têt maneya "çar dost" û navê çar xelîfeyên mezin e (Pala, 2005, r. 99). Feqî di vir da dîsa xelîfeyên duyem û sêyem rasterast navê wan bi kar anîye, lê xelîfeyê yekem û çarem jî nasnavê wan bi kar anîye (4/3, 4/8) ku yê Hz. Ebûbekir "Siddîq" û Hz. Elî jî "Heyder" e. Siddîq ew kes e ku di hemû gotin, hal û tevgerên xwe da rastgo ye. Hz. Ebûbekir ew kesê yekem e ku Îslamîyet qebûl kirîye û lewma jî wesfê siddîq jê ra hatîye dayîn. Çawa ku hedîseya mi'racê bihistîye, yekser rastiya wê qebûl kiriye û lewma ev nasnav (Pala, 2005, r. 403). Bêjeya "Heyder" wekî gelek miletan, Erebb jî ji bo şêran bi kar tînin. Şêr hêz, quwet, cesaret û qehremanîyê simbolîze dikin û lewma ji Hz. Elî ra "Heyder" hatîye gotin.

1.1.7. Muşrikên Mekkeyê

Ebû Cehl ku navê wî yê rastîn Emr e, ji şaxa Mehzûm a Qureyşê ye. Ebû Cehl li hemberî belavbûna Îslamîyetê muqewemeteteke mezin nîşan daye. Ji ber vê çendê jî pêxember ew wekî firewnê vê umetê bi nav kirîye. Der barê xirabî û neheqîyên Ebû Cehl ên dijî misilmanan da gelek ayet jî nazil bûne En'am 6/108; Hicr 15/90; 'Eleq 96/9-18 (Kapar, 1994, r. 117-118).

Dinê bûka **Ebû Cehl** e
Li nik me asîyan nehl e
Li eqlê aqilan tehl e
Li nik Îsa ku murdar e (3/68)

Li gorî Feqî, hew kesekî wekî Ebû Cehl û yên ku li dijî emrê Xwedê bûne asî û serî hildane, dikarin kêfa xwe bi dinyayê bînin, wê wekî bûkekî bedew û xemilandî qebûl bikin, pê şa bibin û herweha kêfxweş bibin. Feqî dibêje, lêbelê çawa ku li cem Îsa Pêxember murdar e, bi wî awayî li cem kesên xwedî aqil û fehm jî tehl e, nexweş e.

1.1.8. Axret (Şehîdtî, Qebr, Berzex, Heşr, Qiyamet, Şefa'et)

Axret, jiyana duyem e ku dê piştî jiyana dinyayê dest pê bike û heta hetayê dewam bike. Bawerîya bi axretê tevî bawerîya bi Xweda û bawerîya bi pêxemberan, ji sê aqîdeyên sereke yên dînê Îslamê ye. Li gorî Îslamê jiyana mirovan bi mirinê bi dawî nabe, lê di çend qonaxan ra derbas dibe û digihîje axretê. Li gorî Îslamê helbet ruhê însan berî ku bigihîje qonaxa dawîn, di qonaxên wekî qebr, berzex û heşrê ra derbas dibe. Li gorî vê, ruhê însan di qebrê da jî dikeve ber jêpîrsînê û li gorî emelên li ser rûyê dinê, yan ezabê dikişîne yan jî nakişîne. Dema em li berhemên Feqîyê Teyran dinihêrin, em dibînin ku têgehên têkildarî axretê yên wekî şehîdtî, qebr, şefa'et, cenet û cehenem hatine bikaranîn.

Şehîdtî

Feqîyê Teyran di destpêka menzûmeya Kela Dimdimê da dibêje, wî mezhebê (Şîe) qebûl nekin û ji bo xatirê Ebû Bekir û Umer xwe di rêya Pêxember da feda bikin, bibin şehîd da ku hûn di mehşerê da rûspî bin, anku ji gunehan bên şûştin û pak bin.

Rûspîtyê di **mehşer** kin
Hernê wan ker bi ker kin
Bi gotina Pêxember kin
Şehîd bin dinê terk kin (17/6)

Di vir da Feqî dibêje, bi gotina Pêxember bikin, biçin şer û cihadê, dijmin kerkerî bikin û bi xwe jî bibin şehîd, wê gavê roja mehşerê hûn ê serbilind bin û nebin ji rûreşan.

Qebr

Feqî, xoceyê bêdebr wekî dikandarekî muflîs wesifandîye ku nikare debara mala xwe bike. Ev xoce mecazen muflîs û bêdebr e, lêbelê di maneyê da anku di heqîqetê

da îflasa wî kesî girantir e, lewra wî ji alîyê emelan va îflas kirîye. Lewma jî qebr dê li wî were hev, wî qebr bike û dê qebra wî tijî xwelî, xubar û mar be.

Dibêjin xoce bêdebr e
Di me'nê da dikan **qabr** e
Tijî toz e tijî xebr e
Qebir teng e tijî mar e (3/16)

Heşr û Şefa'et

Feqî dibêje ku gava bû heşr, ew baxusûs şefaeta pêxember teleb dike û dixwaze rehmeta mezin bi ser da fenanî dilop û qetreyên baranê bibarin.

Xusûsa Seyyîdê Serwer
Di heşrê da bikit **mehder**
Bibarît rehmeta ekber
Şebîhê qetrê baranê (9/22)

Di benda jêr da jî Feqî hêvî û daxwaz dike ku roja mehşerê, xulefayê raşîdîn bên hawara wî û wî ji Pira Siratê derbas bikin.

Ewê roja dibit mehşer
Ebabekr digel Heyder
Meger Osman digel Umer
Mi derbas kin ji nîranê (9/21)

Cenet û Hûrî

Di bendên jêr da jî Feqî teswîra cenetê dike. Li gorî vê, şênîyên ceneta baqî dê bi miştaqî digel xadim, hezkirîya xwe ya dinyayê bi şertê ku ehlê Xwedê be, hûr û xilmanan di qesrên xweşik, mamûr û abad da heta hetayê bijîn.

Digel **xadim** bi miştaqî
Bi muhbet hem tu **uşşaqî**
Bişîne **cenneta baqî**
Biken seyran digel zarî
(10/10)
Biçîne cenneta nûr tê
Hizaran **qesrê me'mûr** tê
Bêhed **xilman** û hem **hûr** tê (10/11)

Tûba

“Tûba” navê dareke li cenetê ye (Uludağ, 2016, r. 360). Di Qur'anê da jî di sûreyên Re'd 13/29 û Waqî'eyê 56/17-40 da jî “Tûba” bi maneya dara li cenetê hatîye emilandin.

Bi heqqê herfê Tahayê
 Di ewradê di dunyayê
 Bibit nêzîkî **Tûbayê**
 Derîn min ji behr û umanê (9/10)

Di vir da Feqî dia û hêvî dike ku ji bo xatirê sûreyê “Ta Ha”yê, ji bin behr û ummanan bê derxistin û bo cihekî nêzîkî Tûbayê bê birin. Helbet Feqî dîsa bal dikişîne ku wîrd û zîkrên li dinyayê jî mirovan dibe cem Tûbayê. Di vir da helbet gelek remz û sembol hene. Feqî bi gotina heqê “Ta Ha”yê va dixwaze bêje ku ew jî mîna Adem, ji ber gunehên xwe were efûkirin. Lewra di Sûreya Ta Hayê da ji xeynî serpêhatîyên Hz. Mûsa, salixê wê yekê jî tê dayin ku Adem çawa ji hêla şeytan hatîye xapandin, lê paşê tobe kirîye û tobeya wî hatîye qebûlkirin. Dîsa remza din jî xilasbûna Hz. Yûnus ji zîkê masî û ji bin deryayan e.

Kewser

Kewser tê maneya çemeki li cenetê ku ji bo Hz. Mihemed hatîye terxankirin (Pala, 2005, r. 268). Peyva “kewser” di Qur’anê da jî di Sûreyê Kewser da 108/1 carekê derbas dibe.

Bê îsm û cismê dilberê
 Çibkim bi **Ava Kewserê**
 Dê îxtîyar kim **seqerê**
 Nar xweştir e ji fîrquetê (17/197)

Di vir da Feqî dîyar dike, heger dilber anku hezkirîya dil nebe, wî ava Kewserê jî navê. Anku ew cenetê jî naxwaze û ew ê cehenemê, agir tercih bike. Helbet em dibînin ku kewser û seqer, du têgehên têkildarî jiyana axretê, anku jiyana ebedî ye. Lewma jî dilber û hezkirina ku di vir da mewzû ye, ne evîneke mecazî, belkî evîneke dîsa bi gotina Feqî, me’nayê anku îlahî ye.

Cehenem

Feqî diaya xwe di vir da jî dewam dike û ji Xwedê dixwaze ku wî ji agirê cehenemê xilas bike. Feqî dîyar dike, yê ku mirov li vê dinê ji tirsê cehenem û agir, li wê dinê jî ji agir bi xwe xilas bike, Xwedê ye û lewma jî ji Xwedê hêvî dike ku wî ji agirê cehenemê xilas bike. Peyva “dozex” di Farisî da (Pala, 2005, r. 125) û herweha di Kurmancî da ji bo cehenemê tê emilandin û di Kurmancî da forma wê ya “dojeh” jî heye.

Ji xewfa **dozex** û **agirî**
 Xilas key min ji vî **narî**
 Bi heşrê dûr î pir xanî (10/5)

Mûcize

Mûcize ew bûyer e ku li ser destê pêxemberan derdikeve holê û anîna nimûneyeke wekî wê ya bi rêya hînbûnê ne pêkan e. Dîsa li gorî pênasîyêke din jî mûcize, ew

hedîseya derasayî ye ku ji hêla Xwedê tê afirandin ku rastgobûna kesê xwe li îdiaya nubuwetê datîne nîşan bide û ji hêla taybetiyên xwe va jî însanan di eczê da dihêle ku nikarin teqlîda wê bikin (Bulut, 2020, r. 348).

Ew horîya şêx babet e
Beyda Yeda cihcennet e
 Lebşekera neyqamet e
 Têk teyyîbata ni'metê (17/304)

Di vir da Feqî amajeyê bi mûcizeya Mûsa Pêxember a di ayetên E'raf 7/108 û Ta Ha 20/22yan da hatîye ravekirin, dike. Li gorî vê Xwedê wiha li Hz. Mûsa ferman dike, "Destê xwe bêxe bin çengê xwe, (dema te derxist) tê bibînî ku spî derket, spîtiyeke ne ji nexweşî ku ev jî mucîzeyeke din e. (Ta Ha 20/22); Destê xwe jî (ji paxila xwe) derxist, ji nişka ve ew jî ji temaşekeran re spî û nûranî bû. (E'raf 7/108)."

1.2. Tesewif

1.2.1. Unsûrên Tesewifi

Ezel

Ezel di ferhengê da wekî hemwateyê peyva "qîdem"ê derbas dibe û tê maneya heyîna ku destpêk jê ra tune. Herweha wekî têgeha felsefî û kelamî jî tê maneya dema bêdestpêk, maweya ku wekî zihnî destpêk jê ra tune û di raborîyê da domkirina heyînê ya heta hetayê (Kılavuz, 1995, r. 49). Li gorî Cebecioğlu jî ezel, nebûna destpêkê îfade dike û bi tenê ji bo Xwedê tê emilandin (Cebecioğlu, 2009, r. 202). Pîsporên Kelamê heyîn ji hêla ezelbûnê va dabeşî sê beşan kirine. Yek, heyîna hem ezelî hem ebedî; ew jî bi tenê Xwedê ye. Dudu, heyîna ne ezelî ne jî ebedî; ew jî kaînat e. Sisê, heyîna ku ezelî nîne lê ebedî ye; ew jî axret e. Bereksê vê jî ne pêkan e. Anku heyînek nabe ku ezelî be, lê ebedî nebe, lewra ya ku qidema sabit be, adema wê anku zewala wê nemumkin e (Kılavuz, 1995, r. 50). Nexwe takeheyîna ku ezelî ye, Xwedê ye û hebûna Xwedê ye. Ji xeynî Xwedê her tişt bi şûnda hatîye afirandin.

Lê dema em li lîteratura edebîyata klasîk dinihêrin, em dibînin ku di behsa ezelê da şair bêtir li ser ayetên E'raf 7/172-173yan rawestîyane. Lewra di van ayetan da ew behs heye ku gava ruh tîn afirandin, Xwedê ji wan pirs dike; "... Ma ez ne Rebbê we me? Hemûyan got: Belê, em şahdeyîyê didin (ku Tu Rebbê me yî)..." Şairan jî ev pirs û bersivdan wekî meclisekê qebûl kirine û navê "bezma elestê" lê kirine. Hinek caran jî ji vê meclisê ra "bezma ezel" yan jî "qalû bela" hatîye gotin (Pala, 2005, r. 72). Dema em li Feqîyê Teyran dinihêrin, em dibînin ku wî jî di vê mijarê da helbestek nivîsîye ku bi heman tarz û lefzê Melayê Cizîrî, bi "Ellah sehergaha ezel" (1/1, Cizîrî, 2009, r. 27) dest pê dike:

Ellah sehergaha ezel
 Ferman dikir subha ezel
 Rih tê mucerred bê 'emel
 Anî di dîwana hisab (11/1)

Anî ji sehra ya 'edem
 Hind kafir û hind mehterem
 Hemya ji bo gerya Qelem
 Reş kir bi wî terzî kitab (11/2)

Feqî dibêje, di wextê sihara ezelê da Xwedê emr û ferman kir, wê hingê ruhên ku hê tu emelên wan tunebû, li dîwana hesabê kom kir. Ew tevda ji çolistana tunebûnê anîn û li wir kirin amadebaşîyê. Li vir qelem ji bo hemûyan lebitî û kitêb, anku lewhê mehfûz reş kir, tijî kir. Ji van hinek wekî kafir û hinek jî wekî muhterem hatin qeydkirin.

Ev helbesta Feqî ji şeş bendan pêk tê. Di vê helbestê da Feqî, Bezma Elestê yekcar teswîr dike û salix dide ku çawa Xwedê, bi lefzê "kun"ê ruh ji tunebûnê afirandin, li sehergaha ezelê kom kirin, pirsra "Ma rebbê we ne ez im?" ji wan kir û ruhan jî bersiva "Belê tu yî." da. Feqî dewam dike û bal dikişîne ku ruhan ev bersiv ne bi îradeya xwe, lê ji ber emrê Xwedê dan. Hetta dibêje, wê hingê ne Adem hebû û ne jî Mîm û Hê (ez), îja em ê behsa îradeya çî bikin.

Dema em li vê helbesta Feqî dinihêrin, em dibînin ku nêrîna wî ya di warê qeza, qeder, îxtiyara kulî û cuz'î da ji ya nêrîna ehlê sunnetê ya Eş'arî û Maturîdî cuda dibe û bêtir nêzîkî Cebrîfeyê dibe.

Sirr

Sir tê maneya tiştê resen û veşartî û herweha tiştê ku veşartî tê girtin. Sir, latîfeyeke Rebbanî ye ku di qelb da ye û herweha cihê mişahedeyê ye (Cebecioğlu, 2009, r. 569). Sir dîsa ew tişt e ku tê veşartin û di edebîyata dîwanê da lêva dilberê wekî sirrekî tê qebûlkin (Pala, 2005, r. 375).

Gerçî ji nutqê lal tu yî
 Bêzar û qîl û qal tu yî
 Lazim bi işqê hal tu yî
 Bêdev î pir ji **sirra qudretê** (1/20)

Di vir da feqî ji bo avê dibêje ku belê, ji hêla axaftinê va tu lal î, tu bêziman û bêaxaftin î, lewma jî divê tu bi şewezarê hal va eşqa xwe îfade bikî û herweha tu bêdev î, lê meger tu gelek sirên qudretê dihewînî. Anku yên ku bi nezera dil li te binihêrin, dê wan sirên qudreta îlahî yên li te barkirî, bibînin.

Zikir

Zikir, bibiranîn e û bibîranîna Xwedê ye. Herweha zikir ew e ku mirov Xwedê bîne bîra xwe, wî ji bîr neke û nekeve xefletê (Uludağ, 2016, r. 393). Zikir di tesewifê da tê wê maneyê ku hin navên dîyar ên Xwedê ji hêla derwêşan bi hejmarên mueyen bîn dubarekirin. Ev peyv û esmayên bi piranî tîn dubarekirin jî ev in: "Allah, hû, heyy, heqq, qeyûm, laîlahe illallah". Zikir du cure ye. Yek, zikrê xefî (zikrê veşartî) ku di dil da tê kirin. Dudu, zikrê celî (zikrê eşkere) ye ku bi eşkereyî tê kirin (Pala, 2005, r. 493).

Zikir dîkir bi remz û raz
 Ji bihna gula baxê mecaz
 Aşê dilê wan hate saz
 Çerx û ger û bez vêketê (17/135)

Di vir da Feqî teswîra derwêşên feqîyên Şêxê Sen'an dike. Li gorî vê, feqîyên şêx ên ku di heman demê da derwêş in, li pêş şêx rêz bûne, fenanî dolab yan jî berê aş, bi remz û raz ketine zîkrê. Ji van derwêşan têtê bêhna gulên û herweha dilê wan coş bûye û fenanî berê aş, dizivirin, deng derdixin, anku zikir dikin.

1.2.2. Tîpên Tesewîfî

Şêx, Murşîd û Pîr

Şêx, murşîd û pîr her sê jî rêberên terîqetên tesewîfî ne. Murşîd ew kes e ku însanan îrşad dike, anku rêya rast, heqîqetê nîşanî wan dide. Helbet ji bo ku heqîqetê nîşanî însanan bidin, ev şêx û murşîd divê bi xwe ji meqamên terîqetê, baxusûs ji meqamê fenayê derbas bûbin, ji hêla îlim û îbadetê kemilîbin, bi exlaqê hemîde anku exlaqê baş xemilîbin û bi wî awayî rêya başiyê nîşanî însanan bidin û wan bigihînin kemalê (Cebecioğlu, 2009, r. 321, 455, 510). Herweha esasekî sereke yê terîqetê ew e ku salik gava tobe kir, divê ji bo xwe rêberekî, anku murşîdekî bineqîne da ku rêya rast nîşanî wî bide. Murşîd jî ew kes e ku bi têra xwe tecrube û ilma wî heyê û gihîştîye meqamê heq (Tavakkoli, 2010, r. 78).

Xizmeta sultan û mîran
 Sin'eta dana û zîran
 Hûn mekin bê şeyx û pîran
 Guh bidine vê şîretê (14/2)
 Mirwet ji mîr û hakimân
 Xizmet li qûl û xadiman
 Bê şeyx û pîr û aliman
 Dayî' mekin hûn taetê (14/4)
 Heçî kesê aqil hebî
 Xizmet mekin bê murebbî
 Da taeta Bersîs nebî
 Hatine ser hîkayetê (14/5)
 Bê şêx û bê ustayekî
 Bi tenê ketî çîyayekî
 Babê divê belayekî
 Êmin mebe ji telûqetê (14/64)

Dema em li menzûmeya Feqî ya bi navê Bersîsê Abid dinihêrin, em dibînin ku Feqî di vê berhema xwe da herî zêde li ser vê mijarê, anku li ser şertê terîqetê yê întisaba bi murşîdekî rawestîyaye. Feqî di menzûmeya navborî da bi tevahî li pênc cihan ku me ew bend li jor destnîşan kirine, însan hişyar kirine ku divê întisabî şêx û

murşîdekî bikin. Feqî bi serborîya kalemêrekî wekî Bersîsê Abid ê ku tamamî jiyana xwe di rêya Xwedê da, bi ilm, zuhd û îbadetê derbas kirîye, xwestîye nîşanî însanan bide ku nebûna murşîdekî ji bo însanan çiqas xetere ye. Em ji vê menzûmeyê hîn dibin, mirovekî wekî Bersîs ê ehlê Xwedê, ji ber nebûna murşîdekî, çawa di axirîya emrê xwe da ji rastîyê dixalife û ji rêya heq averê dibe û dikeve kufrê. Lewma jî Feqî di vê berhema xwe da, çûye hatîye û xetereya vê yekê dubare kirîye ku di hişê însanan da rûnê.

Ji alîyekî din va em dibînin ku Feqî di berhemên xwe da (1/30-31, 14/71) wekî tîpên tesewîfî cih daye însanê kamil, arif, soffî û derwêş jî. Feqî wekî mitesewîfekî mezin dîsa di berhemên xwe da cih daye hal û meqamên tesewîfê yên wekî meqamê wehdetê, meqamê ewlîya û herweha halê hikmetê (14/8-9). Ji ber ku ev behs pir dirêj bû, êdî em cih nadin nimûneyên wê.

Xwendîye Şêx qet **şerîet**
Edeb û rêzê **terîqet**
Çûye nêv behra **heqîqet**
Me'dena **me'rîfetê** (14/59)

Çi heye ku feqî bi vê benda xwe va bal kişandîye ser çar dergêhên sereke yên tesewîfê ku şerîet, terîqet, me'rîfet û heqîqet in. Feqî di vir da bal dikişîne ku Bersîs ji ber ku ji bend û rêzikên şerîet û terîqetê û herweha ji kûrahîya derya û me'denên me'rîfet û heqîqetê bêpar û nehaydar e û herweha întisabî şêx yan jî murşîdekî nekirîye, dawîya dawî diçe xesaretê û kufrê.

1.2.3. Keramet

Keramet, di kesekî da zihûrbûna halekî xariqulade ye ku tu têkilîya wê bi îdiaya pêxembertîyê ra tune. Keramet herweha îkrama Xwedê ya ji bo ebdê xwe yê welî ye (Uludağ, 2016, r. 211).

Ker û gurî û ermîş û lal
Uftade û xelqê betal
Hindî nexwoş baynane bal
Sabî dibûn ji illetê (14/19)

Feqî di vir da balê dikişîne ser kerametên Bersîsê Abid. Li gorî vê, kerametên Bersîs ên wisa hebûne ku çî kerr, lal û gurî û çî jî mubtelabûyî û dînbûyî, kesên ku çûne cem, ji nexweşîyên xwe sax bûne û bi wî awayî vegeirîyane.

Ew xaliqê her ilm li nik
Wî gote Cebraîl çapik
Here ebdêm bigir sivik
Qenc lê bike sîyanetê (15/45)

Ew Cebraîlê pir çeleng
Hate xwarê ji banê felek

Law li hewa girt û gelek
Ji wî ra dikit inayetê (15/46)

Cebraîl hatî bi kerî
Law li hewa girt bi şermî
Danî ser erdê bi nermî
Xilas kirî ji zehmetê (15/47)

Di vir da jî Feqî behsa kerameta Zembîlfiroş dike. Li gorî vê, Zembîlfiroş jina Mîr, Gulxatûnê red dike û bi naçarî xwe ji birca kelehê diavêje xwarê. Lê berî ku Zembîlfiroş were xwarê û li erdê bikeve, Xwedê emir dide Cebraîl ku biçê û ebdê wî li hewa bigire. Cebraîl jî li ser vê fermanê, bi awayekî beza ji banê felekê hat xwarê, xort li hewa qefalt û bi nerman ew danî erdê.

Jinê tendûr hilkir sivik
Zadek nebû bavê kuçik
Derî girt û çûbû ji nik
Mabûn di fikr û heybetê (15/52)
Cînarekî wan hate ser
Agirek ji wan xwast bi xeber
Dema ku wan lê kir nezer
Pêkve te'amêt cennetê (15/53)

Herweha di vir da jî behsa kerametekî din ê Zembîlfiroş tê kirin. Li gorî vê, Zembîlfiroşê ku êdî kar lê kesad bûye û jina Mîr jî lê hatiye xezebê, ji hêla meîşetê va di halekî pir xirab da bûye. Jina wî diçe tendûrê dadide, lêbelê zad û xurekek tune ku çêbike û bixwin. Li ser vê yekê, jînik derî digire, vedigere cem Zembîlfiroş. Wê gavê her du jî şaş û metel dimînin û nizanin dê çi bikin. Lê di wê navberê da cînarekî wan tê û agir dixwaze. Dema diçin ber tendûrê, dibînin ku wa ye sifreyeke tijî bi teamên cenetê li wir e. Di menzûmeya Şêxê Sen'an da jî behsa kerametên Sen'anî tê kirin ku tayî û bayîyan, lal û şilan çawa qenc dike û herweha zalim û jirêderketî tèn û li ber destê wî tobe dikin (17/43-45). Di vir da jî Feqî qala wê kerameta Şêxê Sen'an dike ku li ber destê sibehê di xewna xwe da Hz. Pêxember dibîne. Bi dîtina Pêxember va êdî dudilî di dilê murîdên Sen'an da namîne û pê bawer dibin ku şêxê wan kesekî rastgo û ehlê Xwedê ye.

2. Çavkanîyên Hizrî yê Bingeha Wan Civak e

Dema em ji wê hêlê va ya çavkanîyên hizrî yê bingeha wan civak e, li berhemên Feqîyê Teyran dinihêrin, em dibînin ku Feqî di vî warî da ji unsûrên cuda cuda sûd wergirtine. Bo nimûne em dibînin ku hakim û hikumdar, alim û şair û herweha kesayetên dîrokî û efsanewî di berhemên wî da derbas dibin. Dîsa Feqî di vê

çarçoveyê da serî li dîrok û folklorê Kurdî daye û li ser qewamên navdar ên wekî Destana Kela Dimdim û Destana Zembîlfiroş sûd wergirtîye. Feqî herweha azmûna Bersîsê Abid û Şêxê Sen'an her yek jê kirîye menzûmeyeke serbixwe.

2.1. Kesayet

Di bin vê sernavê da em ê li kesayetên cuda cuda binihêrin:

Desthilatdar

Di berhemên Feqî da desthilatdarên di dîroka kevn da yên wekî Belqîs, Dawûd, Suleyman, Fir'ewn û Haman (3/57, 17/256) û herweha yên di dîroka nêzîk da yên wekî Xan Ehmedê Biradost û Xan Edhem derbas dibin. Dawûd û Suleyman du pêxemberên Cihûyan in û di heman demê da qral in jî. Suleyman kurê Dawûd e û serpêhatîyên wan hem di Tewratê da û hem jî di Qur'anê da derbas dibin. Belqîs jî melîkeya welatê Sebeyê ye û hevçaxê Suleyman Pêxember e. Herweha Fir'ewn bi giştî unwanê qralên Misra kevn e û bi taybetî jî di Qur'anê da ji bo wî qralê Misrê tê emilandin ku Mûsa Pêxember li dijî wî têkoşîn daye. Haman jî dîsa di Qur'anê da wekî peywirdarekî payebilind ê qesra Fir'ewn derbas dibe. Wekî me li jor jî amaje pê kiribû, Xan Ehmed ew kesayetê dîrokî yê ku bi berxwedana xwe va hem di dîroka Kurdî da û hem jî di folklorê Kurdî da cihekî giring girtîye û berxwedana wî bûye destan û li ser zarê dengbêj û destanbêjan hatîye gihîştîye roja me. Dîsa Xan Edhem jî em dibînin ku Serfermandarê artêşa Safewîyan e ku berxwedana Biradostîyan dişikîne û serwerîya Safewîyan cardin qaîm dike.

Rabû **Xanê Zêrînzend** e

Subhê vekir derbend e

Xelqê cindî dixwend e

Reşandin 'enber û qend e (16/7)

Rabû û fermana berxwedanê da Xanê Zendzêrîn, di şefeqa sibehê da derî vekir, ji gel nava gel gazî leşkeran kir û ew bi şekir û bêhnên xwe pêşwazî kirin.

Subhê çûne Ecem e

Esker rûbar û çem e

Di pêş tê **Xan Edhem** e

Girtin dora Dimdim e (16/12)

Serê sibehê leşkerê Eceman ku Xan Edhem li pêş bû, fenanî çem û robaran kişîya û Kela Dimdimê dorpeç kirin.

Şair, Alim û Hekîm

Feqî herweha di berhemên xwe da alim, şair û zanyarên ji serdem û şaristanîyên cuda cuda bi bîr anîne. Dema em li helbestên Feqî dinihêrin, em dibînin ku ji şairên Kurdan wî Melayê Cizîrî bi bîr anîye û herweha ji serdema klasîk a Îslamî jî wî zanyarên giring ên wekî Îbnî Sîna (26/19) bi bîr anîye. Dîsa em di helbestên wî da

rastî kesayetên li pêş ên serdema Yûnana Antîk û herweha Romayê jî tîna ku kesên wekî Platon, Sokrates, Tales û Hîpokrat û herweha Calînûs in (3/55).

Birîndarê 'işqê me dûr im ji siha bihan
Dizanin meddahê kê me di hezar û yek û sihan
Senaxwanê **Melê** me li hemû erd û cihan (7/25)

Feqî di vir da dibêje ku ew ji siha bihan dûr ketîye û dilê wî bi derba evînê birîndar bûye. Ew dizane ku di hezar û yek û sihan da medahê kê ye. Ew li hemû erd û cihan pesn û sena û herweha medha Melê (Melayê Cizîrî) dide.

Kesayetên Dîrokî, Efsanewî û Hîkayewî

Feqî di helbestên xwe da wekî şairên edebîyata klasîk, mezmûn û motîfên serdema Îslamî û herweha serdema pêş Îslamê jî emilandine. Em dibînin ku Feqî cih daye kesayetên dîrokî û efsanewî yê berî zayînê. Feqî kesên wekî Zulqerneyn (3/55), Cemşîd, Qeyser, Hatem, Asef, Xatem, Haman (3/56), Loqman (3/57), Talût û Calût (3/59) û Azer (4/10) bi bîr anîne. Di vir da qralê Makedonî Îskenderê Mezin ê hukimranîya piranîya dinyaya çaxa xwe kirîye, bi nasnavê Zulqerneyn derdikeve pêşîya me. Herweha hukimdarê efsanewî yê Pîşdadîyan Cemşîd tevî qedeha xwe ya efsanewî hatîye bibîranîn. Di vir da ji dîroka Benîsraîlîyan bigire heya efsaneyên Babîlê unsûrên edebîyata klasîk hatine bikaranîn. Li gorî vê, Talûtê qralê yekem ê Benîsraîlîyan û Calûtê (3/59) fermandarê artêşa dijminê wan hatine bibîranîn. Dîsa Asefê ku navê wî yê tam, Asef bin Berahya ye û hem di Tewratê da û hem jî di çavkanîyên Îslamî da derbas dibe. Li gorî van çavkanîyan jî Asef, katib yan jî wezîrê Suleyman Pêxember e. Herweha li gorî Qur'anê, Azer jî bavê Îbrahîm Pêxember e.

Em dibînin ku Feqî ji dîrokeke pir kevn û pê va kesayetên ku mohra xwe li dîroka mirovahîyê xistine, bi bîr anîne û bal kişandîye ku dinya wehareng e ji wan ra nemaye û her dê ji kesî ra jî nemîne. Lewma jî divê mirov bi dinyayê nexape û nekeve gellîyên xefletê.

Wekî destan û hîkayeyên evînî jî Feqî telmîh li evîna Zuleyxa, Mem, Ferhad, Xusrew û herweha Leyla û Mecnûnê kirîye. Heçî hîkayeya evînî ya Şêxê Sen'an û Keça Gurçî yan Ermenî û herweha Zembîlfiros û Gulxatûn e, Feqî ev kirine du berhemên musteqîl.

Şefeq da erd û asmanî
Ji min dil bir bi asanî
Dixwum sondê bi Subhanî
Zuleyxa bû di Misrê da (26/2)

Feqî dibêje li ber bedewîya wê, erd û esman ronî bû. Vê spehîyê bi hêsanî ez jî kirim dilketî ku bi Xwedê sond dixwim, fena Zuleyxaya Misrê bedew bû.

Beraber bû ji wê navê
Xwe talan kir ji wê gavê

Xelas ke **Mem** ji girdavê
Ji tehrîra bi mer keştê (25/14)

Feqî di vir da dibêje ku di wê navberê da bi hev ra bûn, xwe talan kir di wê kêlîyê da, Mem ji gerînekê xelas bike ku bi nivîsê bûyer tê terfîkirin. Mem ê ku di vir da mewzûbehs e, divê Memê Alan be, ne Mem û Zîn. Lewra serdema Ehmedê Xanî piştî ya Feqî tê.

Ez im yê sed keser heyला
Disojit dil ji wê meyla
Binêr **Mecnûn** çî kir **Leyla**
Ku ‘uryan kir di nêv deştê (25/8)

Ax lê, yê ku bi sed keserî dinale ez im, meyla wê ji bo me bûye şewata dil, ka mêze bike Leylayê çî anî bi serê Mecnûn, ew kir dîwane û uryanê çol û deştan.

Pur pehlewane şehsuwar
Hevrîyê Şêx bûn sed hezar
Ferhad û Xusrew nû dîyar
Danîn ji hespê qudretê (17/287)

Bi sed hezaran palewanê şehsiwar hevrîyê şêx bûn, Ferhad û Xusrew nû xuya bûn, ew ji hespê qudretê dan peyakin.

2.2. Qewm

Di helbestên Feqî da wekî qewm Bulxar (3/30), Ermenî (17/226), Gurcî (17/217) û Kurmanc (15/29) derbas dibin. Bulxar bi minasebeta bixûrê, Ermenî û Gurcî bi minasebeta keça ku Şêxê Sen’an dibe dilketîyê wê û Kurmanc jî di Menzûmeya Zembîlfiroş da derbas dibin. Feqî ji bo keça Xirîstîyan a ku şêx dibe evîndarê wê, di benda 217an da gotîye Gurcî, lê di benda 226an da jî gotîye ku Ermenî ye. Helbet di vir da ya muhîm, Xirîstîyanbûna keçikê ye, ne nijada wê. Lê axir, di warê nijada keçikê da tevlihevîyek çêbûye. Ev tevlihevî dibe ku ya Feqî bixwe be, yan jî dibe ku ji ber xetê mustensixan çêbûbe. Lê di eslê vê qîseyê da ku ew jî ya Ferîdudîn Ettar e, ne nijada keçikê, welatê wê tê destnîşankirin û ew jî Rom (Bîzans) e (Attar, 1990, r. 98).

Gul dibê ev lawê ras ne
Mîr li **kurmancan** qîyas ne
Te ji destê min xelas ne
Ho li te didim muhletê (15/29)

Gul ji lawik ra dibêje ev ne rast e, ma qet di navbera Mîr û yekî Kurmanc da qîyas dibe, îja te tune ji destê min xilasî, ha ji te ra didim muhletê.

Helbet me li jor got ku Kurmanc wekî qewm di helbesta Feqî da derbas dibe. Lê bi rastî dema em bala xwe didinê, em dibînin ku Feqî “Kurmanc” di peywendeke

gelekî cuda da emilandîye. Di vir da meqsed ji “Kurmancan”, xelqê ewam e û re’yayê Mîr e. Di vir da risteya duyem, hukmekî radigihîne û bi me dide zanîn ku Mîr, anku tebeqeya rêveber û Kurmanc qîyasê qebûl nake û nabe ku mirov wisa bifikire ku ew wekî hev in. Gava ku mirov vê hevokê vajî dike, wê demê ji bo peyva “Kurmanc” maneyeke neyênî hasil dibe û heta mensûbeke tebeqeya Mîran, wê yekê ji bo xwe heqaretê qebûl dike ku bi yekî “Kurmanc” ra were qîyaskirin û wekî Kurmancekî were qebûlkin.

2.3. Welat û Bajar

Feqî di helbestên xwe da qederek welat û bajar û herweha cihên ku di hin çavkanîyên dînî û efsanewî da derbas dibin jî refere kirine. Mirov dikare Libnan (14/199), Yemen (17/174), Ken’an (26/7) Rom (26/10) wekî welat; Cizîr (7/1), Quds (9/11), Bexda, Şam û Tebrîz (26/9) wekî bajar; Kohê Tûr (7/11, 14/199, 27/3), Rewza Munewer (4/1), Beyta Me’mûr (4/3), Lales (25/13) wekî cihê ku referansa xwe ji dîn distîne û herweha Baxê Îrem (7/15) û Kohê Qaf (27/4) jî wekî cihên efsanewî bijmêre.

2.4. Jiyana Civakî

Bezm û Rezm

Di helbestên Feqî da di warê bezm û rezmê da îfade û teswîrên pir bireng û zindî hene. Baxusûs dema em li menzûmeya Kela Dimdim dinihêrin, em dibînin ku Feqî, ser û cenga ku qewimîye, bi teswîrên pir zindî û şênber va resm kirîye.

Kefa **kûze** û **tas** tê nazik û spîzend in

Qedeha meya xas tê binê talib çend in

Vedxwûn ji destê rastê medhên mehbûb xwendin (7/20)

Feqî dibêje, li ser destê nazik û spîzendan tas û kûzeyê kef li ser tê, qedeha meya xas tê û binêre talibên wê çiqas zehf in, bi destê rastê vedixwin û medh û pesna hezkirîyê didin.

Cama Xwuda sîqal kirî

Tejî **şeraba** al kirî

Qismetê şêxê kal kirî

Dil tahir e dev nadetê (17/306)

Feqî dibêje, qedeha ku Xwedê biriqandîye, bi şeraba sorgevez dagirtîye û kirîye qismetê şêxê kalemêr, lê dilê wî paqij e devê xwe nadê.

Sewaş û qetl û ceng e

Hisar e pir **tifeng** e

Jê dibarin pereng e

Hingî **tîr** û **xedeng** e (16/15)

Xelîfe çûn nîşande
 Şîrê huşîn kişande
 Serî ji laşî firande
 Her sê jî kirne rande (16/50)

Kuştin ji xan û mîran
 Bi tîfing û top û tîran
 Serqut in mislê şêran
 Laş bûne mîna gêran (16/55)

Feqî dibêje, şer û ceng û qetl e, keleh hatîye dorpêçkirin û tîfingên diteqin, bêhesab in û ji tîfingan agir dibare û tîr û sertîr jî di ser da. Ev şerek e ku jê ra terîf û rave tune, lehengên wê bê mînak in ku mertalên xwe dirêj dikin da ku keysa xwe lê bînin û lê bixin. Xelîfe çawa nîşanî wan dan, şûrê hêşîn kişandin, serî ji laşî firandin û her sê jî wekî rendeyê kerkerî kirin. Kuştin ji xan û mîran, bi tîfing û top û tîran, serqot in mislê şêran, laş bûne mîna gêran.

Ev çarîna dawîn pir eşkere û wazih e û pêdivîyê bi şiroveyê nahêle. Lê di vê teswîrê da jî em dibînin ku herdu layenên şerker, ji hêla hêz û quwetê va ne hevseng in û Safewîyan fenanî çem û robaran esker şandine ser Xanê Çengzêrîn. Di vî şerî da em dibînin ku digel alavên şer ên klasîk ên wekî tîr, sertîr, rim û mertalan, alavên şer ên serdemî yên wekî top û tîfing jî hatine emilandin.

Muzîk

Helbet xaneya di vir da derbas dibe, meyxane ye û ew jî di tesewifê da tê maneya tekyayê û herweha bade û mey jî tê maneya eşq û mihebeta îlahî û heqîqetê. Dîsa li gorî mitesewifan, gava ruhan di bezma elestê da bersiva “belê” da pîrsa Xwedê, wê gavê mey û badeya eşqa îlahî vexwarine û bûne evîndarê Xwedê û herweha lewma jî her ruhek dixwaze ji bertengîyên cesedî rizgar bibin û cardin vegezin wê alema îlahî (Gündüz, 1991, r. 418). Ev enstrumanên muzîkê muxnî, çeng û ney jî her yek jê di tesewifê da sembolek e. Çeng tê maneya piştî xûzbûyî ya aşîq û ney jî tê maneya însanê kamil.

Xaneya bade û mey tê
 Muxnî û hem **çeng** û **ney** tê
 Min ji eşqa heyahey tê
 Serxweş û sukran im ez (27/31)

Gotinên Pêşîyan û Biwêj

Feqî çawa ku di helbestên xwe da ayet û hedîs bi kar anîne, bi heman rengî gotinên pêşîyan û herweha pend û şîret jî bi kar anîne da ku uslûba xwe dewlemend û bi xeml û şemal bike û îfadeyên xwe jî bihêztir bike. Di vê babetê da Yıldırım jî bal dikişîne ku şairên serdema klasîk, wekî rêbaz, di helbestên xwe da pendên pêşîyan û şîretan

diemilînin da ku xwîner û guhdar ji metnê dilteng nebin û ji xwe ra pend û şîreteki bistînin (Yıldırım, 2022, r. 22). Dema mirov li helbestên Feqî dinihêre, mirov dibîne ku Feqî berhema xwe ya Beyta Dilî adeta bi seranser bi pend û şîretan xemilandîye. Lewma jî mirov dikare vê helbestê wekî nimûneyeke serkeftî ya emilandina pend û şîretan qebûl bike û herweha çend nimûneyên din jî wiha ne:

Du cara nayê dunyayê
 Çelapa xweş hero nayê (3/46)
 Vêketin her dû bi yarê
 Diz kire malxwê mixarê
 Mast dibê bi tûla sparê
 Mal kire hûcra metê (14/89)
 Kîmya li ba min aqil e
 Însan bi ilmê kamil e
 Re'ya neehlan muşkil e
 Xelqê mudam di xefletê
 (14/133)
 Tehl e heqî li kes xwoş ne tê (14/131)
Muhbet qulûban germ dikit (14/151)
 Kes nîye hewceyê kes ne (17/78)

Eşq û Evîn

Di lîteratura Îslamî da eşq bi gelemperî bi du maneyan hatîye emilandin ku ew jî eşqa îlahî û eşqa beşerî ye. Herweha ji bo eşqa îlahî di heman demê da “eşqa heqîqî” û ji bo ya beşerî jî “eşqa mecazî” hatîye gotin.

Dem a em li helbestên Feqî dinihêrin, em dibînin ku wekî mitesefiwekî mezin, wî jî daye ser vê rêçê û herweha eşq, wekî eşqa mecazî û eşqa îlahî kirîye du beş. Di vê çarçoveyê da em dibînin ku Feqî ji bo eşqa mecaz, pênaseyên wekî “herfa evîn (14/148), narê mecazê (14/151), mecaz (17/4), eşqa mecazî (18/16)” û ji bo eşqa îlahî jî pênaseyên wekî “hal (17/14), (eşqa) heqîqî (18/16) û (eşqa) me'nayê (33/16)” emilandine. Di vir da divê em balê bikişînin ku Ehmedê Xanî jî di warê pênasekirinê da di bin tesîra Feqî da maye û wî jî ji bo eşqa îlahî, pênaseya “me'nayê” emilandîye (Xanî, 2010, r. 488).

Helbet me li jor dîyar kir ku Feqî eşqê wekî mecaz û me'nayê dabeşî du qisman dike. Lê em dibînin ku Feqî van herdu cure evînan bi tamamî ji hev cuda nabîne, belkî bi rengekî dibîne ku yek bêyî ya din nabe. Nexwe li gorî nêrîna Feqî, di navbera eşqa mecazî û eşqa îlahî da rabiteyeke zindî heye ku kiras diguherîne. Bi gotinên Feqî yê wekî “Hal bê mecaz qet nabitin, eşqa mecaz a peyda bûye hêvî dikim ku heqîqî be, mecazî hate me'nayê” em fam dikin ku tişta em jê ra dibêjin evîn, pêşîyê di kirasê mecazê da hasil dibe û dû ra diqulibe ser ya îlahî. Ji lewma jî amanc herçiqas eşqa îlahî be jî, eşqa mecazî jî qonaxeke giring e.

Mîtoloji

Feqî di berhemên xwe da ji mîtolojiyê jî sûd wergirtîye. Gava em lê dinihêrin, em dibînin ku di helbestên Feqî da şopên mîtolojiya Babil, Îran, Çîn û Hindê hene.

Mecnûn kirim ‘acgerdenê
Ew ef’aya ji rengê henê
Geztim li erdê Yemenê
Şehmar û zulf û qameta (17/174)

Feqî di vir da dibêje, wê dilbera ku gerdena wê ji qîlê filan e û herweha wekî marekê yê bi heneyê birengkirî ye, bi şahmeranî, zilf û qameta xwe ez li welatê Yemenê geztim, di wê gavê da min hiş û aqil avêt û bûm mecnûn.

Feqî di vê benda xwe da mezmûna marê û herweha efsaneya şahmaranê emilandîye. Di edebîyata klasîk da porê yarê û herweha ax û zarînên aşiq wekî teşeyî dişibin maran. Heçî efsaneya şahmaranê ye, ew jî di eslê xwe da xwe dispêre mîtolojiya Îranê. Cara ewil di Camasbnameyê da derbas dibe. Camasbname jî bi Pehlewî hatîye nivîsîn û efsaneyên ji serdema Keyanîyan vedihewîne (Erkan, 1993, r. 43).³

Şêx gote wan ev rehber e
Ev **Neynika Îskender** e
Yan meqsed e yan mezher e
Ev şûşeya canê me tê (17/186)

Feqî dibêje, şêx ji wan ra got ku ev şûşe, neynika Îskender e ku meqseda dilê me tê da mezher bûye. Anku şêx dibêje ku rûyê keçikê fenanî neynika Îskender heqîqetê nîşan dide ku meqsed û miraza dilê me jî ev e.

Neynika Îskender di heman demê da wekî “ayîneyê alemnûma” anku neynika ku cihanê nîşan dide, tê emilandin. Li gorî efsaneyê, Îskender wextê bajarê Îskenderîyeyê daye avakirin, ev neynik jî daye çêkirin û li cihekî bilind daye edilandin ku tiştên însan pê nizanin nîşan dide. Herweha Neynika Îskender di tesewifê da jî sembola dilê însanê kamil e ku tê da heqîqet eks dikin (Pala, 2005, r. 48).

Babê **xezîna mar li ser**
Şêx ejderha avête ber
Dêmdur ji dêrê hate der
Îkram kirî kalîn ketê (17/216)

Mar di bawerîyên Çîn û Hindê da wekî xwedanê hikmetê û pasevanê ava heyatê (ava bêdawîbûnê) û xezîneyên binerd hatîye qebûlkirin (Gürkan, 2013, 529). Ji bo piranîya civakên cihanê, mar xwedan mane û simbolên cuda cuda ye. Herçiqaş

3 Herweha di vê babetê da gotara “Şahmaran: Bir Anadolu Efsanesi” ya Didem Z. Havlioğlu û pirtûka “Camasb-name” ya Abdî Mûsa agahîyên berfirehtir vedihewînin.

bawerîyên Çîn û Hindê jêdera sembola çavdêrî û parastina xezîneyê bin jî, em dibînin ev bawerî û mîsyona ku li maran hatîye barkirin, îro roj jî di nav civaka kurdî da dijî.

Di vê bendê da em dibînin ku Feqî, keça Xirîstîyan wekî xezîneyeke di dêrê da dibîne ku marê pasdarê wê jî di amadebaşîyê da ye. Lê şêx ejderhayê diavêje ber û bi wî awayî keça dêmdur derdikeve derva. Di vir da telmîh li ayeta E'raf 7/117an heye. Di ayetê da wiha tê gotin, “Me jî peyxam ji Mûsa re şand (me jê re got:) gopalê xwe biavêje! (Vêca dema Mûsa gopalê xwe avêt), darê Mûsa, werîs û darên wan bi yek carê dabelandin.” Çawa ku gopalê Mûsa bi îzna Xwedê dibe wekî ejderha û dar û werîsên wan sêrbazan tevan dadiqurtîne û sêhrê betal dike, bi heman rengî jî gava şêx ejderhayê diavêje, ejderhayê wî, marê li ber xezîneya di dêrê da dadiqurtîne, sêhrê betal dike û bi wî awayî keçik ji derê derdikeve derva û tê cem şêx.

3. Çavkanîyên Hizrî yê Bingeha Wan Însan e

Dema em li berhemên Feqîyê Teyran dinihêrin, em dibînin, unsûreke din a ku ji hêla hizrî va jêdertîya berheman dike, însan e. Lewra, çawa ku dîn û tesewif, giringîyeke mezin dide însan û wê bi qîmeteke giran dinirxîne, wekî mitesewifekî mezin Feqî jî bi vê nêrînê însan dinirxîne û qîmeteke zêde didê. Di lîteratura Îslamî da hedîsa “lewlake”yê ya “Heger tu nebûyayî min felek (kaînat) nediafirandin” (Demirci, 1997, r. 179) heye ku li gorî vê, Xwedê ji Hz. Pêxember ra dibêje ku heger tu nebûyayî, min kaînat nediafirand, min ji bo xatirê te felek afirandin.

Genc bûn di kenza eqdemî
Baxo ji işqa Ademî
Înane karê alemî
Zahir kirin vê sûretê (1/36)

Dema em li vê benda Feqî dinihêrin, em dibînin ku ev hedîs hatîye bibiranîn. Anku Xwedê ji ber eşqa ademî, ev sûretên ku di xezîneya wî ya ezêlî da veşartî bûn, ji colistana tunebûnê derxistine û anîne meydanê. Ev ademê di vir da însan e, lê însanê ku di hedîsê da amaje pê hatîye dayîn, pêxember e.

Xelqê Xwudê aqil kirî
Hem arif û kamil kirî
Nûrek di dil da hil kirî
Eslê qissê rê dibetê (1/31)

Xwedê di Qur'anê da ferman dike ku wî însan li ser sûretê ehse nê teqwîm, anku sûretê herî baş û xweşik afirandîye (Tîn 95/4). Anku însan wekî madî di teşeyekî mukemel û bêqusûr da hatîye afirandin û dîsa wekî menewî jî potansîyelek tê da hatîye bicihkirin ku dikare bibe însanê kamil. Anku bi gotina Feqî, Xwedê di dilê însan da nûrek ku ew jî nûra Mihemedî ye, hil kirîye û heger însan wê nûrê bişopîne, dê raza qiseyê keşf bike û dê bigihîje meqsûdê.

Ji alfyekî din va jî em dibînin ku Feqî di berhemên xwe da însan ji hêla mezmûnên edebîyata klasîk bi cih kirine. Di vir da jî însan wekî du tîpên sereke ku ew jî aşiq û me'sûq (yar) in, derdikeve pêşîya me. Herweha di vê çarçoveyê da van herdu tîpan di edebîyata klasîk da ya bi sedan salan dewam kirîye, teşe û dirûv girtine û li ser wan, tesewirên hevpar çêbûne. Anku ji bo aşiq û yarê termînolojîyeke standard çêbûye ku şairan li gorî wê, berhemên xwe sêwirandine û ji vê termînolojîyê sûd û mefa wergirtine. Dema em lê dinihêrin jî ev însanê ku di dilqê aşiq da ye, gelek tiştên wî hatine manekirin. Bo nimûne, hîcran û dûrmayîna ji yarê wekî agir û herweha tîr û xedengê hatîye formulekirin ku ezabê dide dilê aşiq, ji ber vê cewr û cefayê sîneya aşiq wekî neyê dinale û cerga wî fenanî kebabê dipije. Dîsa em dibînin ku di vî warî da ji bo yarê jî termînolojîyeke pir dewlemend pêk hatîye ku li vir cihê me tune ye em wê, rave bikin.

Ji ber evîna yara rû wekî rojê dinale, husn û bedewîya dilberê bûye agir ketîye bedenê û ceger lê biraştîye û dilê wî jî bûye fenanî kûzîyekî agir, dişixule û ezabê didê.

Nalî ji dest dêm xawerê
Narê cemala dilberê
Germî gihande cegerê
Dil bû wekî pêt vêketê (17/94)

Di malikên Feqî da însan wekî mehbûb, hezkirî, dost û yar (1/10), refîq, heval û hevrê û herweha hevdil û hevalê wefadar (3/23, 12/1) derdikeve pêşîya me. Di 1/10ê da mixatab av e, lê av bi rêya teşbihê bi însan hatîye şibandin.

4. Çavkanîyên Hizrî yên Bingeha Wan Siruşt e

Di berhemên Feqîyê Teyran da siruşt jî cihekî giring digire. Çi heywanat çi nebatat çî jî cemadat, wekî unsûrên siruştê pêkva ji bo helbestên Feqî bûne jêder û îlham. Feleknaşîya li gorî serdema klasîk, stêrk û gerstêrk, heywanên efsanewî û kovî, dar û giha û herweha çem û robar di helbestan da hatine emilandin.

Alema Kozmîk

Şerm in ji dêmê zerî eqreban derb li dil dan
Xurşîd û Mah Muşterî perwane di muqabil dan
Însan li şiklê perî ya hûr e sîfetwîldan (7/26)

Bi dêma zerî şermende û bi derba biskan birîndar bûne, Roj, Heyv û Jupîter bûne perwane û li dora wê zerîya horîperî fetl û gerê didin xwe.

Pêwer yeqîn xal in di **'iqda Sureyyayê**
Du **Roj** in du **Hîlal** in li dêmê wê Leylayê (7/27)

Ew xal û nîşanên rûyê te gerdena Sureyyayê (komestêrk) ne, li dêma wê Leylayê fenanî du Roj û Hîlalan in.

Digerî di nêv Pîredinê

Qet nanivî nasekinî

Reh şubhetê qelbê min î

Ji mihnetan û zehmetê (1/13)

Tu digerî di nav pîredinyayê da. Ne xew ne sekn ji te ra heye. Tu herwekî dilê min î ku mihnetkêş û zehmetkêş e. Di vir da dinya bi rêya teşbihê wekî pîreke ecûze hatîye teswîrkirin.

Heywan

Wekî me li jor jî behs kir, Feqî di helbestên xwe da cih daye hem heywanên efsanewî û hem jî yê kovî û kedîkirî. Herweha Feqî ev heywan li gorî wan sifet û taybetîyan emilandine ku civakê dane wan û herweha di edebîyata klasîk da di nava demê da wekî mezmûn bi dest xistine. Heywanên ku di helbestan da derbas dibin, bi qasî ku me tesbît kir, ev in: “Enqa (33/8), hudhud (17/256), mar (3/16), goyîn (3/26), dûvpişk (7/26), werdek (12/1), pezkûvî (14/9), tûle/kûçik (14/89), qumrî (14/106), beraz (16/17), semek/masî (17/103), xezal, şêr (17/211), teyxûn (17/214), ejderha (17/216), keftar (17/230), bilbil (27/9)”.

Nebat

Di edebîyata klasîk da şair, dilberê ji hêla nazikbûn û bedewîyê va nexasim dişibînin kulîlkan. Lewra kulîlk pir nazik û hesas in û lewma divê mirov lê miqate be. Şair jî dilberê dişibînin bax û baxçeyekê ku her cure kulîlkan dihewîne û fenanî baxçeyekî kulîlkan bêhna xweş jê tê. Şair di vê çarçoveyê da herî zêde bejn û qameta yarê dişibînin dara selwîyê ku zirav û bilind e, rû û dêma wê jî dişibînin gulên ku bêhnxeş, nazik û nazenîn e. Hinek nebatên ku di helbestan da derbas dibin, bi qasî ku me tesbît kir, ev in: Selwî, bih (2/12), sêv (2/12), belg (7/29), gul/werd, reyhan (2/12), sosin (2/2), dar, mêrg (3/18), pelçim, sorgul, sunbul (3/23), asmîn (3/26), bax, xar (3/22), nesrîn (7/44).

Cemadat

Ji bo cemadatê jî em dikarin wan çend kevîrên biqîmet destnîşan bikin ku di helbestên Feqî da derbas dibin û bedewî û sipehîbûna lêv û diranên dilberê nîşan didin. Bo nimûne: le'l, durr, lû'lû' (7/28,126) û 'eqîq (17/132).

Feqî li vir bi taybetî li ser biharê helbestek nezm kirîye (3/18-27) û bihar ji bo wî çî îfade dike, anîye ziman. Em dibînin ku Feqî, bihar şibandîye cenetê û kêfxweşîya xwe ya ji ber hatina biharê îfade kirîye. Ji alîyekî din va Feqî, bihar wekî demsala evîn û evîndaran jî wesifandîye. Feqî dîsa di van rêzikan da terîfeke îqlima welatê xwe daye. Li gorî vê, bi hatina biharê ra dinya dibe hêşînahî, av zêde dibe, çem û kanî gurr dibin, mêrg û zozan dixemilin. Hetta Feqî dibêje, ew kes ji dinê bêpar in ku vê fesla biharê ya wekî cinetê û van mêrg û zozanên têrçêre û têrav nabînin.

Encam

Edebîyata klasîk li ser hin mezmûn û mefhûmên hevpar ava bûye. Ev mezmûn û mefhûm jî wekî jêder xwe dispêrin hin unsûran. Dîne Îslamê yê bi çavkanîyên xwe yên wekî Qur'an, hedîs, kalam û tesewif û herweha zimanên Erebi û Farisî, dîrok û efsaneyên Îranê, mîtoloji û erdnîgarî ji van unsûrên sereke ne.

Wekî şairekî mitesewif Feqî jî herçiqas bi teşeyî nebe jî, ji hêla mane û alavan ya li ser vê rêbazê helbestên xwe nivîsîne. Feqî mîna her şairekî klasîk helbestên xwe li ser esasê van jêderên hizrî yên hevbeş ava kirine. Dema mirov bala xwe dide berhemên wî, mirov dibîne ku wekî çavkanîyên hizrî wî súdeke pir zêde ji dîn û tesewifê û bi dû ra jî ji civak, însan û siruştê wergirtîye.

Feqî di berhemên xwe da pareke pir zêde ji bo dîn û tesewifê terxan kirîye. Di vê çarçoveyê da Feqî di menzûmeya “Ey avê av” û danberheva digel Melê da bêtir li ser mertebeyên hebûnê rawestîyaye û nêrîna xwe ya di vî warî da anîye ziman ku bi rêberê mitesewifan Îbnî Erebi ra bi hev du dike. Dîsa dema em li helbesta Feqî ya “Ellah sehergaha ezel” dinihêrin, em dibînin ku fikr û nêrînên di vir da hatine îfadekirin, ji nêrîna ehlê sunetê yê Maturîdî û Eşarî gelekî cudatir e û bêtir şiqite bal bi Cebrîyeyê.

Herweha unsûra herî sereke ya ku rengê xwe daye hemû berhemên Feqî, tesewif e û di vir da ew xusûs jî derdikeve pêş ku em dibînin, di piranîya helbestan da şîretên ji bo jiyaneke sûffiyane hene. Feqî ji dîroka mirovahîyê hin nimûne pêşkêş kirine û bal kişandîye ku ji bo azmûneke serkeftî ya dunyewî û uxrewî çî pêwîst in. Helbet di vê çarçoveyê da em dibînin ku Feqî her carê bal kişandîye ser wê yekê ku divê însan bide ser şopa tesewifê û herweha ji xwe ra murşîdekî bineqîne. Lewra Feqî bi nimûneya Bersîsê Abid, însanan hişyar dike ku encama nebûna murşîdekî çend xetere ye û dawîya wê xusran e.

Dîsa dema em lê dinihêrin, em dibînin ku Feqî, destaneke ji dîroka Kurdan anîye û bi gotareke dînî pêşkêş kirîye. Lewra Feqî di menzûmeya xwe ya li ser Şerê Dimdimê da bal dikişîne ku ev şer, şerê heq û batil e û yên bi ser kelehê da girtine, kafir û beraz in. Ji lewma jî li gorî Feqî, Kurdên ku di vî şerî da hatine kuştin şehîd in û yên mayîn jî xazî ne.

Di mijara eşqê da Feqî jî di wê bawerîyê da ye ku du cure evîn hene. Yek jê ya mecazî, ya duyem jî îlahî. Feqî eşqa îlahî herweha wekî eşqa heqîqî û me'navê jî bi nav dike. Li gorî wî, bêtî eşqa mecazî, eşqa îlahî pêk nayê û lewma jî eşqa mecazî ji bo eşqa îlahî wekî pireyekê ye.

Herî dawî em dibînin ku Feqî wekî jêdereke hizrî, sûd ji gotinên pêşîyan jî wergirtine û anîye ev gotinên pêşîyan li gorî maneyê di nav helbestên xwe da bi cih kirine û pê pend û şîret daye însanan.

Çavkanî / References

Açar, C. (2019). *Safevi Kroniklerinde Dımdım Kalesi Kuşatması ve Emir Han Bradosti*. İstanbul: Avesta.

Adak, A. (2015). *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk* (Çapa Sêyem), Stenbol: Nûbihar.

Attar, F. (1990). *Mantık Al-Tayr*. (Çev. Abdülbaki Gölpınarlı). İstanbul: MEB Yayınları.

Bulut, H. İ. (2020). Mûcize, *İslam Ansiklopedisi, C. 30*. İstanbul: DİB Yayınları.

Cebecioğlu, E. (2009). *Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*. İstanbul: Ağaç Yayınları.

Cizîrî, M. (2009). *Dîwan*. (Wergera Tirkî: Osman Tunç). Stenbol: Nûbihar.

Demirci, M. (1997). Hakikat-ı Muhammediyye, *İslam Ansiklopedisi, C. 15*. İstanbul: DİB Yayınları.

Durusoy, A. (2013). Vücûd, *İslam Ansiklopedisi, C. 43*. İstanbul: DİB Yayınları.

El-Aclûnî, İ. b. M. (2019). *Keşfü'l-Hafa*. (Çev. Mustafa Genç). İstanbul: Beka Yayıncılık.

Erdem, H. (2018). "Sadreddin Konevî'de Varlık Mertebeleri ve İbni Arabi ile Mukayesesi", Sadreddin Konevî "Tasavvuf, Felsefe ve Din" (ed. Baykan, E; Kaleci, F.). *III. Uluslararası Sadreddin Konevî Sempozyumu Bildirileri*, Necmettin Erbakan Üniversitesi. (s. 206-224).

Erkan, M. (1993). Camasbname, *İslam Ansiklopedisi, C. 7*. İstanbul: DİB Yayınları.

Gündüz, İ. (1991). Bade, *İslam Ansiklopedisi, C. 4*. İstanbul: DİB Yayınları.

Gürkan, S. L. (2013). Yılan, *İslam Ansiklopedisi, C. 43*. İstanbul: DİB Yayınları.

Havlioğlu, D. Z. (2014). Şahmaran: Bir Anadolu Efsanesi. E. Gürsöy Naskali (Ed.), *Yılan Kitabı* (r. 345-355). İstanbul: Kitabevi.

İbnî Erebi, Muhyedîn (2017). *Fusûsu'l-Hikem Tercüme ve Şerhi*. (Werger û Şîkar: Ahmed Avni Konuk). İstanbul: Türkiye Yazma Eserler Kurumu Başkanlığı.

Kapar, M.A. (1994). Ebû Cehil, *İslam Ansiklopedisi, C. 10*. İstanbul: DİB Yayınları.

Kılavuz, A.S. (1995). Ezel, *İslam Ansiklopedisi, C. 12*. İstanbul: DİB Yayınları.

Levend, A. S. (1984). *Divan Edebiyatı Kelimeler ve Remizler Mazmunlar ve Mefhumlar* (4. Baskı). İstanbul: Enderun Kitabevi.

Meala Qur'ana Pîroz a Kurdî (2015). (Wer: Hüseyin Gündüz, Mehmet Seyhan). Weşanên Serokatîya Karûbarên Dîyanetê.

Mûsa, A. (2023). *Camasb-name*. (Yay. Haz. Müjgan Çakır, Hanife Koncu). İstanbul: İstanbul Büyükşehir Belediyesi Kütüphane ve Müzeler Müdürlüğü.

Nêrweyî, E. T. (2019). *Emîrxanê Lepzêrîn û Kela Dimdim di Navbera Mêjû û Efsaneyê da*. Stenbol: Avesta.

Pala, İ. (2005). *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, (14. Baskı). İstanbul: Kapı Yayınları

Sezer, M. (2024). *Çavkanîyên Hizrî yê Dîwana Melayê Cizîrî*. Teza Doktorayê ya Çapnebûyî, Zanîngeha Bîngolê.

Tavakkoli, M. R. (2010). *Kürdistan Tasavvuf Tarihi*, (Çev. Mehmet Polat). İstanbul: Hivda.

Teyran, F. (2022). *Dîwan*. (Werger û Şîkar: Kadri Yıldırım, Çapa 2yem). T.C. Kültür ve Turizm Bakanlığı Kütüphaneler ve Yayımlar Genel Müdürlüğü Yayınları.

Uludağ, S. (2016). *Tasavvuf Terimleri Sözlüğü*. İstanbul: Kabcacı Yayınevi.

Xanî, E. (2010). *Mem û Zîn* (Amd. M. Emîn Bozarslan, Çapa 3yem). Stenbol: Weşanên Deng.

Extended Abstract

Classical literature is based on a number of common intellectual sources such as religious, mystical, historical and legendary. Poets who produced works in this field have benefited from common themes and concepts. As a sufi poet, Feqiyê Teyran also wrote her works according to the understanding of this world. In this article, all of Feqiyê Teyran's poems have been examined with a descriptive method in order to determine the intellectual sources that form the basis of his works.

Again, in this study, Feqi's intellectual sources have been examined based on four categories: religion, society, human and nature. With this research, it has been determined that Feqi, like other classical poets, benefited from the religion of Islam, sufism and the mythology of the ancient societies of the region, as well as ancient Iranian history and legends. Again, in this research, it has been revealed that Feqi also included Kurdish history as an intellectual source in his works, either before him or in the period in which he lived.

It has been seen that Feqi devoted a large space to religion and sufism in his works. In this context, Feqi focused more on the levels of existence in his poem "Ey avê av" and his conversation with Mullah, and expressed his view on this subject based on the master of sufism, Ibn Arabi. Again, when we look at Faqi's poem "Allah sehergaha ezel", it is seen that the ideas and views expressed here are very different from the views of the Maturidi and Ash'ari ahl al-sunnah and community, and are closer to Jabriyya.

In addition, the requirements of the sufi life are listed in Feqi's works and such a life is recommended for people. Feqi stated that it is almost a necessity to follow a sufi master and warned people with the example of Bersisê Abid that those who do not have a master are in a dangerous situation and their end is disappointment.

Again, it has been seen that Feqi has approached an epic about Kurdish history

with a religious discourse. Therefore, in his work on the Battle of Dimdim, Feqi stated that this war was the war between truth and falsehood, and that those who captured the castle were infidels and pigs. Therefore, according to Feqi, the Kurds who were killed in this war were martyrs and those who remained were veterans.

It has been determined that the names Bulgar, Armenian, Georgian and Kurmanc are mentioned as nations in Feqi's poems. It has been seen that the name Bulgar is mentioned in relation to incense, and the names Armenian and Georgian are mentioned in relation to the story of Sheikh San'an. Here, Feqi states that the girl the Sheikh is in love with is Armenian or Georgian. However, when the original story is examined, it will be seen that the girl's country is stated, not her nationality, and that is Rum, that is Byzantium. Another nation name mentioned in Feq's poems is Kurmanc, that is Kurds. However, it has been seen that Feqi uses this name in a negative context. And with Feq's determination, it is not possible to compare the ruling class, that is the Mir family, with a Kurmanc person, and this is an incomparable situation. In this case, it has been seen that in the world four hundred years ago, the concept of Kurmanc was used for the governed and ordinary people, and the elite ruling class at least did not use this name and even considered it unacceptable to compare themselves with them.

According to Feqi, there are two types of love, one metaphorical and the other divine. It has been seen that Feqi also calls divine love true and meaningful love. According to him, there can be no divine love without metaphorical love, and therefore metaphorical love is a bridge to divine love.

As another result, it has been determined that Feqi also used proverbs as an intellectual source and used them in his poems according to their meanings, and it has also been seen that he gave advice to people when necessary.